

## Navenda Siyasî û Desteya Kargêriyê a PDKÎ lihev civiyan

»»» R:3




## Rostem Cehangîrî: Li gor gotina Dr. Qasimlo hezar dost kêm e, û dujminek jî zêde ye.

»»» R:5



*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

Duheftînameyek Siyasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî

www.agirimedia.org Hejmar (353) 06-07-2019 Buha (1000) Tûmen

## Zeman nagihîjê

»»» R:2



# Di pêşwaziya rêberê herman de

**Sî salî berî niha û di 13.07.1989`an de dîroka mirovahiyê xaleke reş û qirêj li ser eniya xwe dît. Di roja reş ya 22`ê Pûşperé de terorîstên dilreş pêxemberê aştiyê Dr. Qasimlo li Viyen a paytextê hunerê teror kirin.**

Ji vê rojê şûnda heya niha rêvîngên riya bicoş ya Qasimloyê mezin hemû roj û demekê wî rêberê xwe yê leheng bi bîr tînin û îsal jî bona yad û bîranîna wî rêberê kêrhatî kurdên derve biryara “Rasan”a diyasprayê dane, da ku bi kombûna li pêşberî parlemantoya YE ji aliyekî ve peymanê digel rêbaza Dr. Qasimloyê şehîd nû bikin û ji aliyekî din ve jî bi yekîtiya xwe hawara belengaziya gelê xwe bigehînin guhên cîhana neguhdar û terorîzma dewletî ya Komara Îslamî şermezartir bikin.

Hevdem di navxwe ya welat de jî li gund û bajarên Rojhilata birîndar wek salên borî xelkê emegdar û rizgarîxwaz ên nîştiman pêşmergeyên bajar û endam û alîgirên PDKÎ ku bi dersên rêberê xwe ê şehîd hatine perwerdekirin, bi encamdana çalakiyên curbicur ên teblîxî diselimînin ku heya gihîştin bi hêvî û armancên şehîdên riya rizgariyê dev ji xebat û tekoşînê ber nadin û wê bajar bikin palpiştê rastîn ê çiya.

Di vê derheqê de jî Dezgeha Rêkxistina PDKÎ çend rênimayî belav kirine ku weha ne: -Nîşandana kerb û kîna xwe ji siyaset teror û serkuta bixwîn a Komara Îslamî. -Bilindragirtina bîranîna şehîdê rêber Dr. Qasimlo -Xemilandina kolan û şeqaman bi poster û wêneyên taybet bi 22`ê Pûşper -Nivîsandina diruşm û belavkirina tiraktan -Lixwekirin kincên Kurdî -Bikaranîna rengê şîn ê esmanî wekî baweriya Dr. Qasimlo bi aştî û avedaniyê -Mifahstandin ji gulên sor wekî sembola şehîdan



## Sergotar

# Zeman nagihîjê

N: Kerîm Perwîzî

Yek ji taybetmendiyên diyar û derhest ên demê, pêk tê ji vê ku her tiştî demdar dike, û bi derbazbûna zeman, dema wan derbaz dibe. Yan bi gotineke din nûbûna diyarde û bûyeran bi demê ve girêdayî ye, û derbazbûna demê, wan ji nûbûnê dixe, û wan kevn dike.

Lê hindek tiştên taybet di dîrok û jiyana mirovahiyê de hene ku derbazbûna demê nikare wan bixe rexekê, û toza kevnbûnê li ser wan rûnê. Ew tiştên taybetî faktora demê tê de bibandor nine û demdar nînin!

Karesata 22-ê Pûşpera 1368 (13.07.1989)-an, yek ji wan bûyeran e ku dem tê de rawestaye. Rast di vê demê de demjimêr sekiniye û derbaz nabe.

Zeman di vê demê de girev girtiye, û çaverê ye. Çaveriyê penceyekê ku wê bixe ger, û çaveriyê dengekê ye ku bêjê, dadperweriyê cihê xwe girt, û êdî dikare derbaz bibe, lê ew karesat ji wan karestan nine ku heta dadperwerî jî bikare derbaz bike. Tu dad û edaletek nikare karesateke weha derbaz bike. Jiber ku fîşek ber bi rûyê hizr û baweriyê hatiye kirin. Herwekî ku çawa di baxê buheştê de Qabîl bi awayê herî namirovane Habîl kuşt, û heya ku dunya dunya ye, dem ji vê tawanê xweş nabe, dem ji 22-ê Pûşperê jî xweş nabe, jiber ku tu tiştek nine di cîhanê de bikare dadperweriyê cihgir bike, di vê karesatê de. Gelo teqe çawa li hizr û baweriyê tê kirin?!

Ji vê yekê jî girîngtir ew e ku dem nikare bi ser vê hizr û baweriyê re zal be. Ew hizr

û baweriya ku di 22-ê Pûşpera 1368-an a Rojî de teqe lê hate kirin, hizr û baweriyek e li dervy bazineya demê.

Bawerî û hizra Dr. Qasimlo demkî û zemandar nebûn, û kûrtir ji vê hizir dikir, ku zeman bikare toz û axê bixe ser. Ew bîrkirin û baweriya ku Dr. Qasimlo bas dikir û çarçowe û pêkhate jê re dadirişt, û di vê hizr û baweriyê de nebû, ku bo heyamekê bandor hebe, û berjewendiya tak û girûpeke taybet peyrew bike, û piştre bi dabînbûna berjewendiyê êdî bîrkirin û hizir jî dema wê derbaz bibe.

Wî li dervey berjewendiya tak û girûpî hizir dikir, û heta berjewendiya tak û girûp jî bi ew qasê fedakrî û canfîdayiyê ve dikire goriyê hizra bilind ya mirovane, da ku jiyanê bo neteweya xwe watedar bike, û xebatê bigurrtir bike di pêxema gihîştina bi armanca siberojê de, ku pêk tê ji jiyaneke hêjayî mirovê Kurd li ser nîştimana rizgarkirî a Kuristanê.

Wî bîr ji van bingehên jiyanê dikir û digot ku azadî kerametê dide mirov, û digot ku pileya jiyanê ya herî bilind û buhagiran, jiyan e di pêxema armanceke bilind û mirovane de, û ya girîng ji me re mirov e, lewra demê nekariye û nikare bigihîje hizr û baweriya wî, û riya Qasimlo bo niha û siberojê jî her nû ye, û dom heye.

## Dezgeha Rêkxistina Giştî a PDKÎ bi helkefta salvegera şehîdbûna Dr. Qasimlo û hevalên wî daxuyaniyek belav kir



Dezgeha Rêkxistina Giştî a Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê bi helkefta 30'emîn salvegera şehîdbûna Dr. Ebdulrehman Qasimlo sekreterê giştî ê wê demê ê PDKÎ û hevalên wî daxuyaniyek belav kir.

Daxuyanî wiha ye;
Xelkê xebatkar ê Kurdistanê!
Xebatkarên riya rizgarî û azadiya gel û nîştiman!
Heval, alîgir û endamên Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê!
Ti caran nayê jibîrkirin ku 30 salan beriya niha Komara Îslamî a Îranê bi pîlanên xwe ên gemar, Dr. Ebdulrehman Qasimlo, rêberê bêmînak ê tevgera rewa a gelê me û sekreterê giştî ê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê li ser maseya danûstandinê a ji bo aşîtî û bihevrejiyanê, bi hevalê me Ebdulla Qadirî Azer re ku endamê Komîteya Navendî a PDKÎ bû, li bajarê Viyenê ê paytexta Otrîşê (Nemsayê) şehîd kirin û birîneke kûr û giran li cendekê tevgera mafxwazî a neteweya me li Kurdistana Rojhilat dan.

Bi vê xedrê ku li hemberî baweriya Dr. Qasimlo hate kirin, deryayeke kerb û bêzariyê li hemberî kiryarên wê rejîmê ên qirêj li cîhan, Kurdistan û Rojhilatê Kurdistanê bi taybetî derketin holê. Ev 30 sal in ku çîroka vê xedr û îxanena mezin di sîngê neteweya me de ajar vedide.

Xelkê Kurdistanê di bîranîna vê pîlanê de, kerb û bêzarbûna xwe ji desthilata Xumeynî û sîstema Komara Îslamî nîşann didin. Ew, wêneyên şehîdên Pûşperê hildidin û soza xwe bi rêbaza şehîdê rêber Dr. Ebdulrehman Qasimlo re nû dikin.

Roja 22'ê Pûşpera îsal, di 30'emîn salvegera şehîdkirina Dr. Ebdulrehman Qasimlo de ku ji aliyê dezgeha terorîzma dewletî a Komara Îslamî ve hate terorkirin, tê de xelkê Kurd û azadîxwazên Îranê wê hevdem ligel hevalên tevgera me li hemû cîhanê jiyan û xebata Dr. Qasimlo bilind binirxînin û kerb û bêzarbûna xwe ji teror û maşîna terorê a Komara Îslamî bînin ziman.

Xelkê xebatkar ê Kurdistana Rojhilat!
Heval, endam û alîgirên Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê!
Dezgeha Rêkxistina Giştî a Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê bejna xwe li hemberî emegnasiya we a hertimî ditewîne û ji we dixwaze careke din pêşwaziya 22'ê Pûşperê bikin û kerb û acizbûna xwe ji siyasetên terorê ên Komara Îslamî a Îranê û siyasetên tepisandin û rijandina xwînê li Kurdistanê bînin ziman. Bi şêwazên guncaw, bîranîna wan şehîdên me bilind binirxînin. Nav û rêbaza şehîd Dr. Qasimlo bikin slogan û serdêra helbest, sirûd û çalakiyên hunerî û wêjeyî ên xwe. Kolan û bazarên gund û bajaran bi bîranîna şehîd Dr. Qasimlo bixemlînin. Hûn dikarin bi nivîsandina sloganan, belavkirina tirakt û bi daleqandina wêne û postêran weke çiqên darê li çavên dujminan bixin.

Lixwekirina kincên Kurdî, hêmayên rengê şîn ê ezmanî weke baweriya Dr. Qasimlo bi aşîtî û avedaniyê, gulên sor weke sembola şehîdan li cihên giştî û seyrangeh û bajar û gundan, wê bikarin di vê çalakiyê de alîkar bin.

Dezgeha Rêkxistina Giştî a Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê piştrast e ku vîna mîna hesin a xelkê Kurdistana Rojhilat wê pozê zordariya dezgehên tepisandinê ê rêjîma terorîst li ser axa Kurdistanê bişkîne. Xelk wê mezinahiya Qasimloyê şehîd û rêbaza wî bike tîrêja Rasan'ê û ewê bi vî rengî li hemberî rejîma terorîst a Komara Îslamî derkevin.

Serkeve tevgera rizgarîxwaziyê a xelkê Kurdistanê
Biherife Komara Îslamî a Îranê
Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê
Dezgeha Rêkxistina Giştî

## Navenda Siyasî û Desteya Kargêriyê a PDKÎ lihev civiyan

**Serkirdatiya Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê civînek bo nirxandina rewşa niha a siyasî û herwisa ji bo standina helwestên pêwîst sebaretî vê rewşê pêk anî.**

Roja yekşemiyê, 2'ê Pûşpera 1398'an a Rojî, Navenda Siyasî û Desteya Kargêriyê a PDKÎ bi beşdariya Mistefa Hicrî Lêpirsyarê Giştî û piraniya endamên van du rêkxistinan lihev civiyan û tê de rewşa niha a siyasî a Îran û



Kurdistanê hate nirxandin.

Civîn bi xulekek bêdengiyê ji bo rêzgirtin ji şehîdên rizgariya Kurdistanê destpê kir.

Pişt re Lêpirsyarê Giştî ê PDKÎ, bal kişande ser destûra karên civînê û raporteke siyasî di derbarê rewşa Îran, navçe û Kurdistanê de pêşkêş kir.

Wî, rewşa siyasî nirxand û di raportê de behsa rêkarên li pêşberî Kurdan û PDKÎ kir û pêşniyarên xwe ji bo bicîkirina wan gavan pêşkêşî civînê kirin ji bo ku biryarê li ser wan pêşniyaran bidin.

Di berdewamiya civînê de beşdarbûyan, nêrîn û pêşniyarên xwe ji bo xurtkirina raportê anîn ziman.

Civîn heman rojê bi dawî hat û tê de biryarên pêwîst ji bo gavên zêdetir hatin standin.

## Semînareke derheq jiyan û xebata "Simkoyê Şikak" hate lidarixistin

**Yekîtiya Ciwanên PDKÎ, semînarek derheq bîranîna salroja terorkirina "Simkoyê Şikak", jiyan û xebata wî, li bajarê Hewlêrê lidar xist.**



Roja Înê 31`ê Cozerdana 1398`an, Yekîtiya Ciwanên PDKÎ, derheq jiyan û xebata "Simkoyê Şikak" bi amadebûna "Mihemedsalih Qadirî", berpirsê Pêwendiyên Kurdistanî ên PDKÎ li bajarê Hewlêrê û Hadî Ezîzî, dîroknas û lêkoler li bajarê Hewlêrê birêve bir.

Ev semînara bi amadebûna beşek li endamên Navenda Siyasî ên PDKÎ, Saziya Yekîtiya Ciwanên Xebat, û Yekîtiya Ciwanên Şepêla Pêşewro, û komek li ciwan û endamên Yekîtiya ciwanên PDKÎ, hate lidarxistin.

Seminar bi ragirtina bîstek bêdengî bo rêzgiritin ji riha pak ya şehîdên Kurdistanê destpê kir.

Piştire "Ejîn Şêyxî" bêyogirafiya "Simkoyê Şikak" pêşkêşî amadebûyên vê semînarê kir.

Di berdewamiya vê semînarê de, "Mihemdsalih Qadirî", berpirsê Pêwendiyên Kurdistanî ên PDKÎ, li bajajrê Hewlêrê, axavtinek li ser dîroka giştî ya jiyan û xebata "Simkoyê Şikak" û malbata wî, û çavaniya serhildana şoreşa "Simkoyê Şikak", û herwisa çavaniya terorkirina wî rêberê gelê Kurd, pêşkêşî amadebûyan kir.

Piştire "Hadî Ezîzî" di derheq dîroka serkirdeyên Kurd de û li ser çawaniya terorkirina wan li ser maseya danûstandinê axivî, û herwisa got jî ku dujminên Kurdan, dîroka wan serkirdeyan û bi taybet "Simkoyê Şikak" diguherin û dîrokê bi derewan dinivîsin.

Di dawiyê de, "Bêhzad Simko", neviyê "Simkoyê Şikak" û pêşmergê PDKÎ, spasiya birêveberên vê semînarê kir û herwisa axavtinek kurt derheq dîroka malbata xwe pêşkêş kir.

Her di vê derheqê de, "Hadî Ezîzî", di gotûbêja digel nûçegihanê malpera "Kurdistanmedia"yê, di bersiva armanca lidarxistina vê semînarê bi alîkariya Yekîtiya Ciwanên PDKÎ û hewcehiya lêkolîn û bîranîna rêberên Kurd ku şoreşeke wiha afirandine çiye got:

Bêguman hemû neteweyek li ser tiştên baş ên xwe disekinin û van bibîr tînin û bo me neteweya Kurd jî bitaybet di qonaxa serhildana dîroka rewşenbîriya neteweya Kurd, piştî reşnivîsa Yasaya bingehîn, di her du welatên wekî Qacar û Usmanî de, di vê demê de, ku Kurdistan kire du parçe, û ev dîroka hevçerx û girînge û kevrê bingeha dîroka rewşenbîriya Kurd û serhildana tevgera Şikak û "Simkoyê Şikak", hevdeme digel wê zemanî.

Bo me ku neteweyekin ku niha di xebatê de ne û xebata neteweya Kurd heya niha negihîştiye bi armancên xwe, wekî, berdewambûn û hewcehiyek bo xebata niha, hewceye ku em van bîr bînin û dîroka van zindî bikin û lêkolînê derheq rengê jiyan û xebata van encam bidin.

Saziya Yekîtiya Ciwanên Demokrat a Kurdistana Îranê, yekemîn saziye ku di çar parçên Kurdistanê de, semînareke lêkolînê ya bi wî rengî derheq jiyan û xebata rêberê dîroka Kurd "Simkoyê Şikak" lidar dixîne.

## PDKÎ û PDK li ser yekgirtina hêzên siyasî tekez kirin

**Şandekî Pêwendiyên Kurdistanî ên PDKÎ, serdana Encumena serkirdayetiya Partiya Demokrat a Kurdistanê li parêzgeha Silêmanî-Helebçê kir.**

Roja Yekşemî, 2`ê Pûşpera 1398`an (23`ê Hezîrana 2019`an), şandekî pêwendiyên Kurdistanî ên PDKÎ, bi serperestiya "Mihemedsalih Qadirî", berpirsê Pêwendiyên Kurdistanî û di gel "Îsmaîl Rehmanî", nûnerê PDKÎ li Silêmaniyê, serdana Encumena serkirdatiya Partiya Demokrat a Kurdistanê li parêzgeha Silêmanî-Helebçê, kirin û ji aliyê heye`ta Partiya Demokrat a Kurdistanê bi serperstiya "Arif Teyfûr", endamê Mekteba siyasî a PDK Kurdistan û serokê encumenê ve, hatine pêşewazîkirin.



Herdu alî, di hevdîtinek dustane de, rewşa Kurdistan û deverê gengeşekirin û bi hewce zanîn ku yekrêziya hêz û aliyên siyasî û nîştimanperwerên welat di vê qonaxa girîng a dîrokî de, balkêşandine bo ser berjewendiyên welat.

Di dawiyê vê civînê de, heye`ta PDK Kurdistan, tevî spas û pêzanîn bo serdana şanda PDKÎ, û pêdagirî li ser peywendiyên dustane yên herdu aliyan kirin û ser bihêztirkirina pêwendiyên dinavbera herdu aliyan tekezkirine.

## Partiya Demokrat û Yekîtiya Nîştimanî ya Kurdistanê civîyan

**Şandekî Pêwendiyên Kurdistanî ên PDKÎ li bajarê Silêmaniyê, serdana Mekteba pêwendiyên Kurdistanî ên Yekîtiya Nîştimanî ên Kurdistanê kir.**

Roja Yekşemî 2`ê Pûşpera 1398`an (23`ê Hezîrana 2019`an), Şandekî Pêwendiyên Kurdistanî ên PDKÎ bi serperestiya "Mihemedsalih Qadirî" berpirsê Pêwendiyê Kurdistanî, digel "Îsmaîl Rehmanî" nûnerê PDKÎ li



bajarê Silêmaniyê, serdana Mekteba Pêwendiyên Kurdistanî ên Yekîtiya Nîştimanî ya Kurdistanê li bajarê Silêmaniyê kir, û ji aliyê hey`eta Yekîtiya Nîştimanî bi serperestiya Mamoste "Îkram Elî," endamê Serkiradayetî û lêpirsiyarê Mekteba pêwendiyên Kurdistanî ê Yekîtiya Nîştimanî ve pêşvazî ji wan hate kirin.

Di vê civînê de, herdu alî li ser rewşa dever û arîşeyên siyasî ên girêdayî bi hereketên Kurd di Başûr û Rojhilata Kurdistanê de, û hevpêwendî û piştevaniya hêzên Nîştimanî ên Kurdistan, bo çawahiya reftar û rûberûbûn digel pêşhateyan bi hevce zanîn. Û herwisa Girîngiya jihevfêmkirin û hevrêziyê li navbera hêzên siyasî bo parastina destkevtên neteweyî li rastaya berjwendiyên xelkê Kurdistanê bi hevce zanîn.

Di dawiya civînê de, herdu aliyan tekez li ser pêwendiyên dustane di navbera herdu aliyan de kirin.

## Dezgeha Rêkxistin a PDKÎ, çendîn dewreyên leşkerî lidar xistin



**Para eşkere ya dezgeha rêkxistina giştî ya PDKÎ, di berdewamiya kar û çalakiyên xwe de, çendîn dewreyên taybet ên leşkerî lidar xist.**

Di meha Cozerdana îsal de, para eşkere ya dezgeha rêkxistina giştî ya PDKÎ, di berdewamiya çalakiyên xwe de, bi merema perwerde û hînkirina endamên PDKÎ di wê parê de, bi alîkariya dezgeha fermandehiya hêza pêşmergê Kurdistanê, çendîn dewreyên leşkerî bo parek li endamên dezgeha rêkxistin a para eşkere bi rê ve bir.

Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, li despêka avabûna wî heya niha û li ser bingeha bawerî bi perwerdekirin û pêgihîştandina kadir, pêşmerge û endamên xwe, bi lidar xistina dewreyên cuda ên wekî: Siyasî û leşkerî, hewla perwerde û hînkirina hêzeke amade ji warê siyasî û leşkerî ve daye û liser vê rêbazê jî berdewam e.

## Şer di navbera Hêza Pêşmergê Kurdistanê û terorîstên Sipaha Pasdaran de çê bû



**Li navçeyên çiyayî ên Pîrabşarê, Hêza Pêşmergê Kurdistanê ji bo parastina kolberan bi Spaha terorîstî a Pasdaran re pev çûn.**

Demjimêr 3 û nîvê piştî nîvro a roja yekşemiyê 9'ê Pûşpera 1398'an a Rojî, terorîstên Spaha Pasdarên rêjîma Îslamî a Îranê û caş û sîxurên wan li sînorên navbera Pîranşar û Çonanê teqe li kolberan kirin.

Wê demê, hejmarek ji Hêza Pêşmergeyên Kurdistanê ku li navçeyê liv û tevgerên xwe pêk dianîn, ji bo parastina wan kolberên hejar bi pasdaran re pev çûn.

Agahî amaje dikin ku Sipaha terorîstî a Pasdaran piştî têkçûnê, ji bo tolhildanê, heya demjimêr 5 û nîvê êvarî, navçeyên çiyayî ên Kurdistana Başûr li sînorên navbera Çoman û Berdesoran, ku cihê jiyana xelkê sivîl e, topbaran kirine.

Li gor zanyariyan, ti ziyanên Hêza Pêşmergeyên Kurdistanê di vî şerî de tine bûne û piştî ku wan, hêzên rejîmê ji wir dûr xistin, karên xwe li wir domandin. Heya niha ti zanyariyek di derbarê xesarên terorîstên Sipaha Pasdarên rêjîma Îslamî a Îranê de dest neketine.

# Gotûbêjek digel birêz Rostem Cehangîrî berpirsê Dezgeha Çavdêrî a PDKÎ Derheq bûyera Viyenê



**Rostem Cehangîrî: Li gor gotina Dr. Qasimlo hezar dost kêm e, û dujminek jî zêde ye.**

H: Kêyhan Mihemednjad

### P: Dr.Qasimlo çawan karî Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê ji girêdayîbûna bi xet û fikrên cuda ve vegerîne ser hêla serxwebûn di biryaranê de?

B: Dr.Qasimlo gelek xebat kir ku PDKÎ siyaseteke serbixwe hebe û wî bi hizr, fikr, zehmet û xebata xwe karî endam û alîgirên Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê îmanê bi xwe û hizra serxwebûna xwe bînin. Eger wisa nebe ewê ziyanbar bin û wê bibin hewsarê destê xelkê! Li gor Dr. Qasimlo berjewendî, dost û hevalan li hev nêzîk dikin û di siyasetê de biratî tine ye belkî berjewendî, bira û dostan destnîşan dikin.

Berjewendiyên Kurdan li Başûr ji berjewendiyên Bakur cuda ne. Yan berjeweniyên Tirkiye u Îranê di mijara Başûr de ji hev cuda ne. Ji bo vê armancê dibe rêberekî zana u agehdarî siyaseta navçeyê û cîhanê hebe ku heval û neyarên xwe li gor berjewendiyên welat û xebata xwe destnîşan bike û biryarê bide. Wî da selmandin ku dost û heval di siyasetê de heya dawiyê weke berê namînin û dikarin bêne guhertin. Dibe ku dujminê duh bibe dost. Herwisa dibe ku hevalê îro, sibê bibe neyar.

### P: Rola Dr.Qasimlo di nasandina pirsa Kurd de li derveyî welat çawan dinirxînî?

B: Li gor Dr. Qasimlo hezar dost kême û dujminek geleke. Mebesta wî ev e ku divê Kurd li pey dost û hevalan bigerin û dengê xwe bigihînin neteweyên din. Temenê zarokatiya şehîd Dr. Qasimlo hevdem bû ligel avabûna Komara Kurdistanê û wî jî, ji Komara Kurdistanê bandor girt. Bi çavên xwe dorpêça nawdewletî dîtibû ku hev girtin û berjewendiyan, ew li hev girê dan û di hiloşîna komara Kurdistanê de Berjewendîyen aborî û siyasî û daxwaza neteweyekê kirin qurbaniya berjewendiyên xwe.

Lewre jî hertim digot dibe gelê Kurd bikare li Ewropa u Amrikayê dostan bixwe peyda bike ku bikare dengê mezlûmiyeta xwe bogihîne navenda biryarên navdewletî. Wî bixwe li Ewropa dixwand û gelek dost û heval peyda kirin ku di encamê de ji bo doza Kurd û Kurdistanê bi mifah bûn û Dr. Qasimlo karî bi vî rengî, doza Kurdistanê di nava civaka Ewropayê de bi başî bide nasandin. Ez bawer im bandora wî rêberê Kurd heya niha jî li ser nasandina Kurdistanê her heye.

### P: Çima jiyana Dr.Qasimlo tam bi xebat û siyasetê ve hate girêdan?

B: Dr. Qasimlo ji ber ku ji malbateke navdar û xwedî hêz û siyasî de bû ku di wê serdemê de Komara Kurdistanê hate avakirin, lewma jî tevlî siyaset û naskirina doza Kurd u Kurdistanê bibû. Pişt heyamekê bixwe jî tevlî xebata xortan bû û bi damezrandina Yekîtiya Lavan li bajarê Ormiyê û pişt re li Tehranê û li Ewropayê bi başî li ser azadî u demokrasî u doza neteweyên cuda lêkolîn kir. Têza xwe a diktorayê jî li ser Kurd û Kurdistanê nivîsand ku di wê serdemê de navûdengek mezin ji bo wê têzê çê bû.



Bi vî awayî, Dr. Qasimlo bindestiya neteweya xwe bi başî xwand û lêkolîn li ser bindestiya wan kir û dixwas jê re çaresriyê bibîne. Bi fikr û zanebûn û bandora Pêşewa Qazî Mihemed serokkomarê Kurdistanê û şehîdkirina Pêşewa û dagirkirina Kurdistanê û darvekirina xortên Kurdan û nebûna wekheviyê bi jiyanê li navçeyên din ên Îranê re hest bi nebûna wekheviyê kir û dest bi xebatê kir. Li gor wî diviyabû hebûna xebatkaran di refên Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê de û bi pêşîneya vê partiyê û serkirdeyên wê, sedemên baş bûn da ku xebata xwe berdewam bike.

Bi nerîna min, kesatiya wî a zanistî, civakî û têgihiştina wî a derbarê mafên neteweyên bindest û bi taybetî Kurdan kariye bibe cihê baweriya hevalên PDKÎ û di asta serkirdatiya wê partiyê de cih bigire û wê partiyê bi pêş bixîne. Lewre jî di tevahiya kongireyên PDKÎ de bi dengê endaman dihat hilbijartin û di komîteya navendî de jî bi dengê nihênî bû sekreterê giştî ê PDKÎ.

### P: Dr.Qasimlo çawan li ser pirsa netewî difikirî?

B: Dr. Qasimlo baweriyeke tam bi serxwebûna Kurdistanê hebû. Rewşa navçe û cîhanê taybet bû û di mijara perçebûna Kurdistanê de berjewendiyên wan dewletan û zilhêzan jî ew li hev girê didan û rê nedidan serxwebûn bê ragihandin.

Di vê pêxemê de dixwast mafên netewî di çarçoveya wan welatan de û bi dabînbûna demokrasî u mafên siyasî û çandî bicî bike. Bi vî awayî wî dikarî gelek dost û hevala ji bo doza Kurdistanê bibîne. Bi dîtina min, Dr. Qasimlo karî serkeftinê bi dest xwe ve bîne û dengê Kurdan bigihîne civaka navdewletî û dewletên mezin ên cihanê. Li gor wî, diviyabû Kurd gav bi gav û bi riyên siyasî û dîplomasî, mafên xwe bidin dabînkirin û bi vî rengî ew dikarin tevahiya xwestekên xwe dabîn bikin. Bi vê armancê ew hertim li ser dabînkirina demokrasiyê li wan dewletan rijd bû ku Kurd tê dijîn.

### P: Rola Dr.Qasimlo di asta xebata giştgir a Îranê de çawan dinirxînî?

B: Rol u neqşên Dr. Qasimlo di asta Îranê de cih û dewseke taybet hebûn. Slogana demokrasî bo Îranê û xutmuxtaî ji bo Kurdistanê ku ew dahînerê wê bû, serkeftin bi dest xwe ve anî. Tişta yekem ev bû ku wî karî xebata Kurdan bi xebata demokrasîxwaziyê ve li Îranê li hev girê bide bi vî awayî, karî di nav neteweya serdest de dost û hevalan ji bo doza Kurdistanê bibîne. Tişteke din a girîng ev bû ku karîbû hevbendiyê di nav partiyên seranserî ên Îranê de pêk bîne ji bo mînak hevbendiya bi Micahidînê a Gelê Îranê re û pirojeya xutmuxtariyê bi wan re îmze kir. Ev jî di dîroka xebata rizgarîxwaziya Kurdan de li Îranê bê mînak bû û weke serkeftineke mezin ji bo tevgera Kurdistanê tê binavkirin û wek belgeyeke bê hempa di dîrokê de hate nivîsandin. Dikarim bêjim ku slogana demokrasiyê a tevgera Kurdan bû ku neteweyên din li Îranê jî ew hildane.

# Qedexeya cixarê di girtîgeha Amedê de



**N: Bûbê Eser**



Gardiyan dibêje;
"Bi îcateke nû me kişandina cixarê jî ji bona girtiyan qedexe kiribû. Ev îcata leşkerekî jî hêla Derya Spî bû. Tiştê ku me dikir ev bû: Berê me gardiyanan di nava xwe de biryara cixare topkirinê dida, û em ji hev bela dibûn. Em her yek diçûn qawişên xwe, dema me kapaxa şibaka ku di deriyê qawişê de vedikir, hemû girtî diketin sekina nîzamî, berpirsiyarê qawişê direviya ber derî, komûta xwe ya nîzamî dida. Piştî komûta wî, min digot:

-Berpirsiyar! Divê tu cixareyên di qawişê de hemûyan bide hev. Eger yek cixare di qawişê de bê dîtin, tu zane wê çi bê serê we.

-Tu emir bike komûtanê min. Me şibake digirt û em derdiketin, me dizanîbû ku emirê me wê bê cih. Piştî qederekê dema em li qawişê vedigeriyan, berpirsiyar cixareyên top kiribû, hemû danî bû ber deriyê qawişê û li benda min bû. Hemû cixare li ber derî li hêla hundir dabûn serhev. Carna jî dema cixarên me diqediyan, pakêtên wan li derve didan serhev û me kê çi şikil cixare bixwesta ji xwe re derdixistin. Ji xwe di dema qedandina cixareyên me de, me ev yeka hanê dikir. Bi vê yekê him me tiryakiyên cixarekêşên qawişê tesbît dikirin, him ew disîplîna ku me dixwest, tesdîq dibû. Tu karî bêje "gelo çima we dixwest tiryakiyên cixareqêşên qawişê tesbît bikin?" belê ji xwe ya girîng jî ev bû. Ji wan kesên tiryakî gelek bi saya serê cixaran, bûne alîkarên me. Gelek ji wan kesên weha, nikarîbûn bê cixarekişandinê bisekinin. Me ew kesên weha derdixistin, cixare dida wan û peyv ji wan digirt, ev jî bûbû îcata me ya nû. Bi vê metodê em gelekî bi ser ketibûn.

Her qawiş pêwîst bû ku lîsteya xwe ya cixarekirînê, rojên duşema hazir bikirana, û bidana gardiyanê xwe. Dîsa rojeke Duşemê bû ku me gardiyanan gazî hev kirin. Çi ye, ne çiye, hate gotin ku qawişa ...... ketine grewa cixarenekişandinê, em çûne vir, gardiyanê wê qawişê dest pê kir û got:

-Hevalno! qawişa min lîsteye xwe ya cixarekirînê nedan, dema min xwest, berpirsiyarê wan ji min re got: "Kesek cixarê naxwaze" bi rastî jî li gor nîzama girtîgehê ev grewa cixarenekişandinê bû. Lewra jî berpirsiyarê me yê gardiyan ê bloka D bi awayekî zirt deng li berpirsiyarê qawişê kir:

-Berpirsiyar zû were! Çi ye ev halê we? Çima we lîsteya xwe ya cixarekirînê nedaye gardiyan?!

-Komûtanê min kesên ku cixarê bikirin tune ne, hemûyan gotin em nakirin, em ê êdî cixarê nekşînin.

Berpirsiyarê me fitilî ser gardiyanê wê qawişê û got:

-Gardiyan zû derî veke û hemû girtiyan derxin derve, em binerin bê hela cixarenekirîn çawa ye!

Gardiyan derî vekir, girtî yeko yek derketin derve. Em li wir qederê 20 gardiyanan kom bûbûn. Ji xwe di bûyerên weha de em nevêrîbûn bi tenê biçûyana ser wan. Girtî giş derketin derve. Me hina dar û hina jî jop girtin destên xwe, û ketin nava wan. Te digot belkî em di nava kerîkî pez de ne, tiştê ku me anî serê wan nayê gotin. Hinek ji wan serê wan hate şikestin, hin kes jî destên wan û yên wisa jî hebûn ku nig û parsûyên wan şikestin. Tu kes bi halekî saxlem venegeriya qawişê. Dema me li wan dida, yuzbaşiyê me li jor li me dinerî. Me girtî giş xistin halekî din, ew dîsa xistin hundirê qawişê, derî girt û gardiyanê wan deriyê şibakeyê vekir û got:

- Berpirsyar!

Berpirsiyarê qawişê reviya hate ber derî, komûta xwe da û got:

-Emir bike komûtanê min!

-Heta saetekê divê tu lîsteya cixarekirînê hazir bike.

-Tu emir bike komûtanê min!

-Haa, îro xwarin ji we re tune ye, hûn sûcê xwe dizanin.
-Tu emir bike komûtanê min!
Me karê xwe yê muqedes qedandibû, bi lêdana wan em jî hebekî rehet bû bûn. Hîn em ji hev belav ne bû bûn, yuzbaşî hate ba me û got:

-Aferîm, zarokên min aferim. Ez li her derê dikarim bi serbilindayî pesnê we bidim. Îro xwarina we ya nîvro li ser min e. Divê hûn herin bajêr, li loqanta ku hûn dixwazin xwarina xwe bixwin û araqê jî vexwin. Gazî sergardiyan kir got:
-Sergardiyan.

-Emir bike komûtanê min!

-Ji te re pere û van hevalan bibe, li bajêr xwarinê bide wan.
-Tu emir bike!

Bi vî awayî em fêrî lêdanê bû bûn, bi vî awayî zikê me bi kesî nedişewitî, ji ber berjewendiya xwe ya şexsî me dikarîbû her tişt bikira. Li hember wan bûyerên me, yuzbaşî hertişt pêşkêşî me dikir.

Dema nîvro em hemû li erebê siwar bûn, çûn ber loqanta ku di bin gokdelana Diyarbekrê de, ya bi navê "Asim Kebab Salonu" dihat naskirin. Restoranteke navdar û xwarinên wê jî biha û xweş bû. Xwarin û vexwarina ku me bi lêdana wan girtiyan heq kiribû, xwar. Bi zikekî têr, bi çavekî sor em vegeriyan girtîgehê. Ma gelo kes hebû ku berjewendiya xwe nede pêş. Li me jî weha hatibû. Ji bo pariyek nan, ji bo kevçiyek xwarin, ji bo rojek îzîn an jî ji bo qedehek araq, tiştê me dianî serê wan kesên girtî dûrî aqila bûn..."

## Nerîna Lîderan



“Donald Trump”:

“Îran bi agir dilîze!”.



Jeremy Hunt:

“Hekî reîma Îran rêvketina Bercamê binpê bike, emê ji wê rêkkevtinê derkevin”.



Isra`îl Katiz:


“Îran ber bi şerekî ve diçe ku vê rastî derbeyên giran bê”.



Hesen Rohanî:

“Asta mehandina Uraniyomê bo her astek ku em bixwazin emê zêde bikin”.

# Mezinahiya Qasimlo




N: Ebdulezîz Qasim

Miletê kurd, weke miletekî kevin û dêrîn, herdem ji mirov û kesayetiyên mezin û navdaran bêpar nebûye. Di dîroka Gelê Kurdî de, gelek zanevan û kesên bilîmet û hêja hatine dinyayê, û ked û paşmayek mezin li pişt xwe hiştine û ked û xebata wan bûye mîretekî mezin, û ew jî bûne sembol û hêma û hetahetayê di wijdana me de her sax û namirin.

Li dema em wan mirovê mezin yên şûntiliyên wan kûr di dîroka kurdî li bîra xwe tînin, yekser Dr. Ebdulrehman Qasimlo, li bîra me tê, weke sembol û rêberekî herî mezin yê serdema tevgera rizgarîxwaza kurdî û serdema nasyonalîzma kurdî, ku her ji kelha Dimdim destpê dike, û heta digihîje serdema Simkoyê Şikakî û dgihîje Mihabad û Barzan, û heta rêfrandomê û serxwebûna Kurdistanê.

Mezinahiya Qasimlo, divegere karîzma wî ya kesayetî, weke rêberekî û dîroknas û dîplomatkar û siyasetmedarekî herî mezin yê miletê kurd, ku karibû rejîma Îranê neçar bike li ser maseya diyalogê ji bo pirsa kurdî rûnê. Lewra ji ber mezinahiya Qasimlo, ew ji aliyê dijmin û dagîrkerên Kurdistanê ve bû armanc, herwiha ku di dirêjahiya dîrokê de, jinavbirin û terorkirina kesayetiyên mezin yên gelê Kurd mîna Qasimlo û Simko û Pêşewa, yek ji armancên sereke yên rejîmên dagîrker bûn, nemaze ji aliyê desthilatdarên li Îranê, çi li serdema paşatiyê û çi jî li serdema Komara Îslamî ku bûye çavkaniya terorîzma dewletê li ser asteke mezin li diniyayê, ne tenê li ser asta Rojhilata Navîn, herwiha li ser asta Ewropayê jî, ku Dr. QASIMLO, li welatê



“Österreich” li ser maseya danustandinê hat terorkirin, û paşî Dr. Şerefkendî li Almaniyayê hat terorkirin, bi destê terorîstên rejîma Îranê, û digel bêdengiya herdu hikûmetên “Österreich” û Alman, ku bo wan dê her li ser eniya wan bimîne dexmeke reş û kirêt. Di dîroka şoreş û serhildanên kurdî de, gelek caran doza kurdî bûye qurbaniya berjewendiyên herêmî û navdewletî, herwiha bi mixanbinî dibêjin ku terorkirina rêberê kurd Qasimlo, ket di nav bazarên berjewendiyên Ewropa digel rejîma Îranê de, ku heta niha jî gelek welatên Ewropayê berevajî hemû prensîb û yasayên mafên mirovan, hêjî palpişt in ji bo rêjîmeke gunehbar bi terorîzma navdewletî.

Tevlî terorzîma dewletê ya rejîma Îranê, gelê kurd û PDKÎ û tevgera kurdî li Rojhilat neket di hêlên şaş û xelet de, û rêbaz û hêla xwe ya netewî parast ji pirsên felsefî “îdeoljî”, olî, tundrewiyê û terorê, û herdem kariye keltur û çanda xwe ya aştiyane û lêborîna civakî biparêze, tevî ku terorkirina Dr. Qasimlo û rêberên din yên kurdan ziyanek mezin e, lê di heman demê de bi şanazî dikarin bêjin ku rejîma Îranê şikest di plan û armancên xwe yên terorîst de, ku tevgera kurdî karî rêbaza xwe ya netewî ya demokrat dûr ji dav û xap û pilanên dijmin biparêze, bi xurtkirin û parastina kesayetiya dîrokî ya mirovê kurd ya cuda û serbixwe.

# Sermiyaneke hizrî, me`inewî û exlaqî



N: Selîm Zencîrî

13’ê Tîrmeha îsal, yad û bîranîna 30 saliya bi armancgirtin û hingavtina dilê rêberekî karîzmatîk e ku ji aştiyê re lêdixist. Dujminê bîrteng wusa dihesiband ku bi şehîdkirina Dr. Qasimlo, dikare tevgera kurd jî bifetisîne, lê bêhay ji vê ku sermiyana hizrî, siyasî û bîr û ramanên Dr. Qasimlo, weke mîratek hizrî û exlaqî wusa reh û rîşalên xwe di nav tevgerê de dakutayne, ku tu carî namire û nakeve. Çunkî Qasimlo, lîder yan rêberekî sade û bêpêgeh nebû, belkî akademîsyenekî dahêner, bîrmendekî pragmatîst, rêberekî modern, ensîklopîdyayeke dewlemend, dîplomat û balyozekî çalak û bişiyan, pêşmerge û demokratek û bidisîplîn, siyasetvanekî realîst û mamostayek aştîxwaz û ...hwd bû, lewma ji piştî derbazbûna sî salan bi ser şehîdkirina wî re, ew rêbaz e, qutabxaneya şoreşvanî ya modern û rûgeha azadîxwazan e, mîratek siyasî, me`inewî û exlaqî ya buhagiran e.

Gava mirov karnameya Dr. Qasimlo wekî her rêberekî din dinirxîne, hingê ye ku cudahiyên wî bi yên din re eyan û çend gavan pêştir derdikevin. Berevajî rêberên din, zanayî û karînên Dr. Qasimlo ew bi dunyayê da nasîn, nek pile û payeyên siyasî yan civakî. Dr. Qasimlo bi salan li Ewropayê jiya, lê Kurd û Kurdistan hertim kakila hizrîn û tekoşîna wî bû. Lewma jî bi awayekî şoreşvanî dev ji jiyan, rehetî, saman û pîşeya zanistiya xwe li Ewropayê berda, û li pêxema gelê xwe de jiyana dijwar û bi zehmetî, lê tejî ji şanaziya pêşmergatiyê li çiyayên Kurdistanê hilbijart û heta mîrata malbatî ya xwe jî bo tevgerê û hewcehiyên wê mezaxt.

Dr. Qasimlo bi şiyan, ceribîn, dunyabînî û jêhatiyên xwe ve, rinsansek mezin li nav Hizba Demokrat de bi rê xist, û bername û pêrewa hizbê li ser bingeha demokrasiyê û serbixweyiya siyasî û aborî darişt û kire rêbaza siyasî ya Hizba Demokrat. Wate vegera Dr. Qasimlo, destpêka vejandin, xurtkirin û demokratîzekirina PDKÎ bû, û li midehek kêm de Hizba demokrat kire hizba herî bihêz ya opozîsyona rejîma Îranê.

Dr. Qasimlo, şoreşvanekî demokrat bû ku baweriyek kûr bi demokrasiyê hebû. Ew li ser vê baweriyê bû ku demokrasî diyarde yan tiştek taybet bi hin kes yan welatan nine, belkî deskeftek mirovî ye û ‘‘xebat bo demokrasiyê nabe biçe bin bandor yan sîbera xebat bo mafên netewî yan çînayetiyê’’. Wate bihevregirêdana xebata netewî û demokrasiyê ji baweriyên Dr. Qasimlo ve çavkaniyê digre. Bi vê manayê ku ne demokrasî bi bêy çareseriya pirsa netewî, wateya rastîn a xwe heye û ne jî pirsa netewî bi bêy demokrasiyê, çareser dibe. Her ew raman e ku xwe li durûşma hingê wî serdemî ya Hizba demokrat ‘‘Demokrasî bo Îranê û Otonomî bo Kurdistanê’’ de didît. Gotinek Yasir Erefat, rêberê koçkirî yê Filistîniyan di gotûbêja bi Kirîs Koçêra re heye, ku pesna vê ramana Dr. Qasimlo dike, ku dibêje ‘‘Dr. Qasimlo him xebata çekdarî meşand û him jî demokrat ma’’.

Azadî û dadperwerî li nerîna Dr. Qasimlo de tenê gotinek devkî û rûyekî nebû, belkî têgeh û baweriyek negor bû ku li liv û tevgerên wî li jêr navê sosyalîzma demokratîk de bi başî xwe nîşan didan. Hevalbendiyek cuwan ya her du têgehan, ku vegeşîn, xurtbûn û wekheviya civakî û siyasî bi dûre tê. Armancek ku niha jî xwast û hêviya



xebatkarên vê dozê û hewcehiya hemû xelkê Kurdistan û Îranê ye bi qasê nanê şevê.

Dr. Qasimlo bîrmendek pragmatîst, stratejîst û şoreşvanekî moderne netewî bû ku gotin û kiryarên wî hevdu dikemilandin. Wî bona gihîştin bi armancê, xwe ji kiryar û rêbazên tundûtûj ên şoreşgerên kilasîk bi dûr girt, û li dijî teror, teqandin, rehîngirin, êxsîrkuştin û reftarên xirab bi zarok, jinan, rêgirî û ...hwd bû. Ew aştîxwaz bû, û berdewam tekez li ser çareseriya aştiyane ya pirsa kurd dikir. Piştî agirbenda 25-ê Xezelwera 1980-î, bona nîşandana niyetpakiya xwe bê pasevan çû mîtînga sedhezar kesî ya Mehabadê û li wir jî, “lebêyk” ji peyama Xumêynî re got. Ew du gav, û yên şûndatir jî nîşana pêdagirtina wî bûn li ser rêbaza aştîxwazane ya wî, û her eva ye ku bi ‘‘pêxemberê aştiyê’’ tê nasîn.

Her ew baweriya aştîxwazane ya Dr. Qasimlo bû ku ew rapêçî telika demokrasiyê li jêr navê gotûbêj bona çareseriya pirsa kurd kir, û bûye goriyê îxaneta dîplomatîk û terorîzma dewletî ya Îranê, û xisar û derbek mezin li peykerê PDKÎ û gelê kurd û demokrasiyê li Îran û deverê ket. Her eva ku wezîrê hingê yê dewleta Firansayê got ku: ‘‘Terorkirina Dr. Qasimlo, xencerek bijehrî bû ku li dilê demokrasiya nûgiha û li halê vegeşînê a Rojhilata Navîn ket’’.

Dr. Qasimlo nîşan da ku wekî reberekî karîzmatîke gelê kurd, hevalê rojên dijwar û heta ser ên gelê xwe ye, lewre jî xweştivî û rêbazzîndî ye, û tîrojkên bîr û hizrên wî berdewam şewqê didin riya rêvîngên rêbaza tejî ji serfirazî û şanaziye wî.

Helbestvanê kurd Hacî Qadir Koyî çi xweş dibêje ku:

‘‘Merg û jîn weke sîber û tav e
Ya ku dimîne her nav e’’.

Lê Dr. Qasimlo ji bilî nav, rêbazek li pey xwe hişt, ku him bûye sermiyan û mîratek mezin ya fikrî û siyasî û exlaqî bo rêvîng, hezkirî û şopînerên xwe, û him jî remz û nîşana man û hermana xwe bo heta-heta.

# Şêwazê serokatî û siyaseta Dr.Qasimlo



N: Nûredîn Sofîzade

Dr. Qasimlo, wek rêberekî lêzan di nav serokên demokrat û pêşketî de bû. Lê wî hertim girîngî dida aliyên kevneşopiya civatgehê jî. Dema ku ji Ewropa dihate Kurdistanê çanda welatên sêyemîn û Rojhilata Navîn jî bandor dikirin ser wî. Dr. Qasimlo, sosyalîst bû, lê ne stalînîst bû.

Di nav partiya xwe de jî pîvanên demokrasiyê pêk dianîn û bixwe jî mirovekî demokrat bû. Ew dostê sosyal demokratên Ewropayê bû. Lewma jî karî partiya xwe bigihîne Enternasyonala Sosyalîst. Di riya Dr. Qasimlo re hin partiyên siyasî ên Kurd jî derbasî nav Enternasyonala Sosyalîst bûn.

Dr. Qasimlo taybetmendiya xwe a demokratîk û serdemiyane, kire piroje û bi rengekî vekirî xiste nav PDKÎ. Dr. Qasimlo ji bo bi dabînkirina mafên gelê Kurd, demokrasiyeke xurt pêwîst didît. Dr. Qasimlo digot: Baweriyeke me a tem bi rola bingehîn a demokrasiyê heye. Bê hebûna demokrasiyeke mayînfe û xurt, di Îranê de, mafên netwa Kurd li Kurdistana Îranê wê tim di bin tirs û givaşa jinavçûnê de be. Tenê rêya bicihbûn û berdewambûna xudmuxtariyê li Kurdistana Îranê, hebûna demokrasiyeke tem û serkeftî çê dibe.

Dr. Qasimlo û PDKÎ baweiyeke kûr bi demokrasiyê hebûn. Dr. Qasimlo, di derheqê vê pirsê de digot: Di Kurdistanê û di nav Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê de, baweriyeke me a mezin û kûr bi demokrasiyê heye û em di vê baveriyê de ne ku bêy dabînkirin û cîhgirbûna azadiyên demokratîk, welatê me nikare wan pirs û kêşeyên aloz çareser û safî biket ku em ji berê ve ji dest wan dinalin. Dr. Qasimlo li dijî terorîzmê bû û lewma jî demokrasî diparast. Dr. Qasimlo digot: Li gor baweriya min, tevgerên xwedî hêz, yanî ew tevger in ku ji bo azadiyê dixebitin û xelkê piştevaniya wan dike. Ji ber vê jî nabe em hewara xwe bibin ber terorîzmê. Ti pêwîstiyeke me bi terorîzmê nîn e.

Terorîzm, azadî û jîna xelkê sivîl û bêguneh tevî tirsê hember dike û tenahiyê têk dide. Terorîzm, siyaseta fermî a Komara Îslamî ye û berpirsên wê di salên derbasbûyî de bi fermî heman tişt ragihandin û çend caran li dijî me bikar anîn, lê em terorîzmê mehkûm û şermezar dikin. Dr.Qasimlo tişta ku digot ew dikir. Ev jî taybetmendiya serokên pêşketî û demokrat e. Di siyaseta wî de durûtî di gel gelê Kurd tine bû. Tişta ku li hemberî gel bigotiba, ew jî dikir.



Qasimlo ew kes nebû ku wek li pişt deriyan Kurdistana serbixwe bixwaze, li ber deriyan jî ji bo ku li ber çavên dujminan şêrîn be, behsa xudmoxtariyê bike. Dr. Qasimlo hertim dubare dikir û digot: Siyaset wek hunera mumkin e. Lê xala jar û lewaz a tevgera Kurdî eva bûye ku heya niha yan her tişt xwestiye yan ti tiştek nexwestiye, lewra siyaset ne reş û sipî ye, belkî di navbera reş û sipî de rengên din jî hene.

Di baweriya Dr. Qasimlo de, di navbera hêviyan û siyaseta realîst de cudahiyeke mezin heye. Lewra pêwendiya siyasetê bi rastî û heqîqetên hundir, herêmî û cîhanî re heye. Dr. Qasimlo di siyasetê de biryardana serbixwe gelek girîng didît. Wî bawer dikir ku divê em di serî de girîngiyê bidin raya gelê Kurd û pişta me bi xwe û bi xebata me germ be û xwe wek binasekî serbixwe di orta siyasî a welat de bidin kifşê, wêdemê êdî piştevanên me wê zêde bibin û wê egera serketina me baştir pêk bê. Fikar û ramanên berfireh û mezin û dûrbîniya Dr.Qasimlo heya îro jî bo me û rêvîngên rêbaza wî bûne ronahî û em li ser wan hêlên diyarîkirî berdewam in.

# Rejîm li Kirmaşanê hewla jinavbirina çand û muzîka Kurdî dide



N: Ce`ifer Eskenderî

Çand û mûzîka Zagrosê ku jografiya Kurdistanê li xwe digire, beşeke kevnar a dîroka çana Rojhilata Navîn e.

Bajarê Kirmaşanê bi dîrok û çanda xwe a kevnar ve naskirî ye. Mûzîka Kurdî a Yarsanan jî beşek ji dîroka wî bajarî ye ku li kêleka rîtmên Hewramî, ji kevnartirîn rîtmên nûzîka Kurdî ne.

Di salên derbasbûyî de dewleta Hesen Rûhanî bicîkirina Destûra saziya Şûnwarên Dîrokî ên Neteweyên Yekbuyî UNESCO a naskirî bi 2030'an da sekinandin. Li gor wê biryarê, diviyabû dewlet ji bo pêşxistina çand û zimanên neteweyên ne Fars li Îranê tevbigere. Ew destûr weke pêşxistina berdewam a civakê jî hatibû naskirin. Bi



sekinandina Destûra UNESCO 2030`an li wî welatî, bê guman neteweya Kurd jî bi çanda xwe rastî metirsiyê tê. Elî Xamineyî rêberê Komara Îslamî ragihand ku ew belge, çanda welatên rojava ye û em rê nadin bê bicîkirin ji ber ku li gor Xamineyî, ew destûra destnîşan dike ku divê heya sala 2030'an çanda Îslamî li Îranê nemîne û neteweyên cuda û jin û karker jî li wî welatî bibin xwedî maf.

Bi vê biryara Xamineyî, gelek ji çalakvanên Kurd, dengê nerazîbûnê hildan. Komeke mûzîkjenên Yarsanî li Kirmaşanê ragihandin ku êdî bi sekinandina vê destûrê, Îran zêdetir ji berê rê li ber asîmîlasyon û qirkirinê vedike. Wan mûzîkjenan, nameyek ji parlamenterên Kurd ên Kirmaşanê re şandin û tê de tekez kirin ku heke ew destûr neyê bicîkirin, dibe ku mûzîka Kurdî a herî kevnar li Kirmaşanê ku navê wê mûzîka Yarî ye, ber bi jinavçûnê ve here. Ew dibêjin qirkirin, ne tenê kuştin e. Lê belê dema ku bûdceya wezareta Çandê, ji mûzîka Kurdan re tê qedexekirin, wê demê êdî ew nûzîk ber bi jinavçûnê ve diçe û ev jî tê wateya qirkirina çandî.

Ew dibêjin heke çanda Kurdî jî li Kirmaşanê li gor reşnivîsa 17 xalî a biryarnameya Neteweyên Yekbûyî, li Kurdistana Rojhilat di nava 9 salan de bêyî cudahî ji jin û zilaman re bê vegotin, êdî bandora modernîteyê jî li ser çanda kevnar namîne û a Îslamê jî.

Riftara Îranê bi çandên cuda re li gorî biryarên Neteweyên Yekbûyî nîn e ku li gor wan, her kes bêyî ku rastî cudahiya ji ber nijad, reng, zayend, ziman, ol, baweriya siyasî an jî yeke din jêbûna netewî an jî civakî, saman, zayîn an jî rewşeke din bibe, xwedî sûdwerirtina ji hemû maf û azadiyan e û divê dewlet li pişta wan bin.

Li Îranê ne siyaseta Kurdî li gor van biryarên NY cih girtiye û ne jî çanda Kurdî ji aliyê dewletê ve tê dîtin.

Komara Îslamî qet naxwaze mûzîk û bi taybetî jî a kevnar bê pêşxistin. Ji ber ku Elî Xamineyî di fetwayekê de dibêje guhdariya mûzîkan, derfeta gunehan çê dike. Li gor vê fetwayê jî, êdî wezareta Çanda Îslamî, ti pereyekî ji bo pêşxitina warê mûzîkê terxan nake û bicîkirina wê niha li Kirmaşanê ji parêzgehên din zûtir destpê kiriye.

Dibe ku rejîm bixwaze jinavbirina mûzîka Kurdî ji Kirmaşanê ve destpê bike. Ji ber ku eger piştevaniya aliyên hikûmî tine be, gelek kes dev ji mûzîka kevnar berdidin.

# Hatin bo kuştina rojê, lê tovê azadîyê bû

Hatin bo kuştina rojê, lê tovê azadîyê bû
Hatin wekî şev a tarî, wate ya rûnahîyê bû

Destên gemar xistin bi kar, da bişkinın bıniya darê
Da wemrînin têna rojê, reşemê bînin adarê

Bêhna azadîyê ji me, hêvîyê ji dilan dûr xin
Hatin disa wekî hecar, birîn bû axa gelê min

Evrekî reş ser serê me, mizgîn, ne baran û buhar
Ne biratî ne wekhewî, lê xedra dewlet a zordar

Em hatin bigrin destê wan, lê ew dest ji xwînê sor bûn
Me got em hemî bira ne, lê ji mirovahî dûr bûn

Gawa gehiştin dema xwe, şûna bira bûn gurên har
Bûne xencer û cergê me, bo wan bûye nîşan û kar

Di kela germ a havînê, bi hecet a hewpeyvînê
Pîlanên wan yên hovane, em kirin mêvanê şînê

Em nêzîk bûn ji buharê, zivstan li me vegerandin
Eş û janên bindestîyê, li ser gelê me sepandin

Ji warê Urmîya rengîn , mêrxasekî bi nav û deng
Li dinyayê bibû mînak, rêberek zana û çeleng



Hatibû azadî ya me, mafê gelê me yê bindest
Bistîne ji dagirkeran, ji dujminên kevneperest

Roja esmanê kurdan bû, hêvîya axek birîndar
Xweragir bû li hemberî, gef û zordarî ya neyar

Wisa gotin ew nemîne, kes nîne cihê wî rûnê
Gotin gawa ew ji nav wan çû, kurd dê bê hêvî bimîne

Ketin tevgerek bê rûmet, ta dawî bê şoreş a me
Bi xeyalên wan yên wala, wê bisekîne koşiş a me

Ew şehîd bû ta bimîne, şanazî ya dîroka me
Rêya wî jîyana me ye, rêbaza wî ye doza me

Tim xevin a xayînan xave, em rêwîyê rîya wî ne
Kes bawera azadîyê, dilê me de namirîne

Helbestvan: Hejar Par (Kelankanî)

# Zimanê Kurdî

Berkarê nersteder :

Cînavên nîşandan di raweya verêsê tenê de dibin berkarên nerasteder . Wek :

1- Zînê pênûsek daye vî hevalî .
- Tu çawa gihiştî vê qûnaxê ? - Koçer hildiperikin van çiyan .

2- Min alîkariya vê keçê kiriye
- Pelên van darên ha diweşin . - Çavên wan dayikan ziwa nabin .

3- Em ji vê dozê venagerin .
- Kurd bi vî zimanê xwe hene - Li wan malên ha vehesin .

Ji van her dû cînavên nîşandan (ev, ew) û ji raweyên wan ên verêsê (vî, vê, van, wî, wê, wan) çend bêjeyên kurtebir bi şêweyekî gelêrî sivik bûne û li hindek herêmên (K J) bikar tên . Hin ji wan bêjeyên kurtebir û pevxistî, hêj weku cînavên nîşandan tên xebitandin û hin jî bi têgehine dîtir bikar tên. Ew bêje jî ev in :

1- Viya (Vîna) :

Ev bêjeya pevxistî weku cînavekî nîşandan bikar tê û ji vê raweya verêsê (vî yê ha) kurtebir bûye . Li vê gorê jî, ev cînavê pevxistî bo destnîşankirina navên nêz, yên nêrzayên yekjimar bikar tê .

Wek :
- Viya (vîna) alîkariya min kiriye .
( Vî yê ha) alîkariya min kiriye . ( Vî kesê ha...) - Ez viya, baş nas dikim . - Mêvanên me xizmên viya ne .

2- Vêya (vêna) :

Ev cînavê kurtebir û pevxistî ji raweya verêsê (vê ya ha) hatiye pevxistin û ji bo destnîşankirina navên nêz, yên mêzayên yekjimar bikar tê . Wek :

- Vêya (vêna) helbestek xwend .
( Vê ya ha) helbestek xwend . ( Vê kesa ha....)

- Helbesta vêya kêşsaz bû .
- Min helbesta vêya nivîsî .
Bi dîtina min, ev her dû raweyên van cînavên nîşandanê (vî yê ha, vê ya ha) bi vî şêweyê jêrîn bûne (viya, vêya) : - Her dû cînavên nîşandan (vî, vê) wekî xwe mane. - Her dû zêder (veqetandek), (yê, ya) hatine avêtin :

(vî...ha, vê...ha) .
- Tîpa (h) ji (ha) yê hatiye avêtin :

(vî....a, vê....a)
- Tîpa navbira dengdêran (y), ketiye navbera her

dû tîpên dengdêr (î,a) û (ê,a) :
(vî, y, a) û (vê, y, a) .
- Tîpa (î) ji (vî), li gora rêzimanê( )Sivik bûye :(viya ) Di van her dû bêjeyên kurtebir de (vîna, vêna), dîsan ew guherînên li jor, gav bi gav pêk hatine, tenê li şûna tîpa navbir (y), tîpa (n) ya navbir bikar hatiye : (vî – n- a, vê –n – a) .

Hêja ye gotinê ku ev her dû tîpên navbir (y, n), di hindek gotinan de cihê hev digrin .
Wek :

- Kêmayî = Kêmanî .
- Dûrayî = dûranî .

Ev her dû cînavên kurtebir û pevxistî (viya, vêya) jî, bi şêweyekî gelêrî (li hindek herêman) siviktir bûne û bi rengê (vaya) têne xebitandin . Ev jî devokeke gelêrî ye, dûrî zimanê petî ketiye .

3- Vana : Cînavekî nîşandan e ji (van ên ha) kurtebir bûye. Ev cînav bo destnîşankirina navên nêz, yên komjimara her dû zayendan (nêr û mê) bikar tê . Wek :

- Vana em fêrî zimên kirin .
- Em li vana dipirsin .
- Hevaltiya vana bêsûd e .
Ev cînav jî, ji (van ên ha) hatiye kurtkirin û pevxistin : - Van mêrên ha = van ên ha = van...a = vana - Van jinên ha = van ên ha = van... ...a = vana

4- Wiya (wîna) :

Ev jî cînavekî nîşandan e, ji raweya resen (wî yê ha) kurtebir û pevxistî ye. Ev cînav bo destnîşankirina navên dûr, yên nêrzayên yekjimar bikar tê .
**Dom heye...**

# Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (353)

## Çend wêneyên dewra perwerdehiya leşkerî ku ji aliyê Dezgeha Rêkxistin a PDKÎ ve bi rê ve çû







